

**Nirxandina
Rapirsîna
Tora Ziman û
Çanda Kurdî**





Projeya Çavdêriya Mafên Zimanî û Çandî

Nirxandina Rapirsîna Tora Ziman û Çanda Kurdî

Omer FÎDAN

Amed, Gelawêj - Rezber 2020

**ÇAVDÊRIYA MAFÊN
ZIMANÎ Û ÇANDÎ**

Nirxandina Rapirsîna Tora Ziman û Çanda Kurdî

Amed, Gelawêj - Rezber 2020

Nivîskar:

Omer Fîdan

Edîtor:

Ulaş Güldiken

Mîjanpaj:

Zafer Tüzün

Tora Ziman û Çanda Kurdî

Diclekent Mah. Selahattin Eyyubi Bul. Altın-4 Sitesi C Blok Altı No:53/E
Kayapınar - Diyarbakır

Web: www.torakurdi.org

E-mail: info@torakurdi.org

Tel: 0549 660 22 21



Ev weşan di çarçoveya Bernameya YE Etkiniz de, bi piştevaniya Yekîtiya Ewropayê pêk hatiye. Ji naveroka vê weşanê tenê Komeleya Berî Her Tîştî Zarok berpîrsiyar e û bi ti awayî fikrên Yekîtiya Ewropayê temsîl nake.

Naverok

<i>Destpêk</i>	6
1. Dahûrandinên Sereke	10
2. Dahûrandinên Berawirdî	23
3. Dahûrandinên Giştî	27
<i>Wek Encam</i>	28
<i>Pêvek: Mînaka Rapirsînê ya ku Hatiye Çêkirin</i>	29

Lîsteya Grafîkan

Grafîk 1: Rewşa beşdarên rapirsînê ya li gor temenê wan	10
Grafîk 2: Rewşa beşdarên rapirsînê ya li gor zayenda wan	11
Grafîk 3: Navên zarokên ku beşdarên rapirsînê wan ji nêzîk ve nas dikin	12
Grafîk 4: Ji zarokên ku beşdarên rapirsînê ji nêzîk ve nas dikin çend bi Kurdî dizanin û diaxivin	13
Grafîk 5: Zarokên ku beşdarên rapirsînê wan ji nêzîk ve nas dikin û navên wan bi Kurdî ne ji wan çend bi Kurdî dizanin û diaxivin	14
Grafîk 6: Aktîvîstên ziman û çanda Kurdî di sala 2019an de çend berhemên bi Kurdî (pirtûk, kovar, CD û hwd.) kirîne?	15
Grafîk 7: Aktîvîstên ziman û çanda Kurdî di sala 2019an de ji berhemên bi Kurdî (pirtûk, kovar, CD û hwd.) yê ku kirîne çend ji wan ji bo zarokan kirîne?	16
Grafîk 8: Aktîvîstên ziman û çanda Kurdî di sala 2019an de li çend şanoyên ku zimanê wan Kurdî ye temaşe kirine?	17
Grafîk 9: Zarokên ku aktîvîstên ziman û çanda Kurdî ji nêzîk ve nas dikin li kîjan kanalên TVyê yê zarokan temaşe dikin?	18
Grafîk 10: Zarokên ku aktîvîstên ziman û çanda Kurdî wan ji nêzîk ve nas dikin ji wan çend li TRT Çocukê temaşe dikin?	19
Grafîk 11: Zimanê yekem ê ku beşdarên rapirsînê di medyaya civakî de bi kar tînin kîjan e?	20
Grafîk 12: Zimanê duyem ê ku beşdarên rapirsînê di medyaya civakî de bi kar tînin kîjan e?	21
Grafîk 13: Hejmara zimanên ku beşdarên rapirsînê di medyaya civakî de bi kar tînin	22
Grafîk 14: Li gor temenê beşdarên rapirsînê dahûrandina berawirdî	24
Grafîk 15: Li gor zayenda beşdarên rapirsînê dahûrandina berawirdî	26

Lîsteya Tabloyan

Tablo 1: Li gor temenê beşdarên rapirsînê dahûrandina berawirdî	23
Tablo 2: Li gor zayenda beşdarên rapirsînê dahûrandina berawirdî	25

Destpêk

Lijneya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî (NY)¹, têkildarî Şerta NYyê², bi awayekî zelal gotiye ku yek ji armancên wan ên bingehîn ên damezirînê ew e, cihêkariyên ku bingeha xwe ji nijad, nasnameya etnîk, zayend, zîman û herêmparêziyê digirin, asteng bikin. Li gor vê biryara ku tê de heşt peymanên têkildar û “metnên din ên ku dewletên endam di bin banê NYyê de destnîşan kirine” jî hatine bibîranîn, hatiye diyarkirin ku divê dewlet mafên zîmanî, çandî û perwerdehiyê yê kêmar û gelên din ên di binê hikumraniya xwe de biparêzin û bi heman awayî hatiye gotin ku divê dewlet li hemberî maf û çalakîyên van gelan ên têkildar ên ji bo parastin û pêşvebirina mafên xwe yê kolektîf jî rêzdar bin. Her wiha di Biryara Lijneya Giştî ya 2009an³ de jî hatiye gotin ku mafê perwerdehiyê mafek e ku nayê dewrkirin û dest jê nayê berdan. Dîsan di vê biryarê de hatiye gotin ku bi pêkanînen de facto û de jure dibê ku cihêkarî çêbibe û bi pêkanînen bi vî awayî pirsgirêkên civakî yê girîng derdikevin holê. Ji lew re, hatiye gotin ku divê dewlet ji bo bikaranîna mafê perwerdehiyê yê gelên di bin hikumraniya xwe de bi awayekî rast û rasteqîn hewl bide ku derfetan biafirîne.

“Zîmanên biyanî cil û bergên me ne, lê zîmanê dayikê çerm û bedena me ye; mirov dikare cil û bergên xwe biguherîne, lê nikare çerm û bedena xwe biguherîne.” Ev gotina bi nav û deng a nivîskar û mamosteyê Fînî Antti Jalava ya ku tevahiya Kurdan ji devê xemxur û xîretkêşê nemir ê zîmanê Kurdî Celadet Alî Bedirxan bihîstiye di van salên dawîn de li ser zar û zîmanê hemû Kurdan e. Hemû Kurd li gel nêrînen siyasî yê ji hev gelekî cuda, di mijara girîngiya zîmanê dayikê de bûne yek û li her derê, di her qadê de vê gotinê dubare dikin. Lê zîmanê dayikê çi ye?

Peyva *dayik* a di vê têgihê de derî li ber tevliheviya di pênaseya vê têgihê de vedike. Ev peyv dike ku têgiha *zîmanê dayikê* û *zîmanê etnîkî* bên tevli-

1 United Nations, “General Assembly Resolution, A-Res-47/135,” 3.02.1993,

<https://documents-dds-ny.un.org/doc/UNDOC/GEN/N93/076/55/IMG/N9307655.pdf?OpenElement>, hat dîtin: 17.01.2021.

2 United Nations, “UN Charter,” 26.06.1945 <https://www.un.org/en/charter-united-nations/>, hat dîtin: 17.01.2021.

3 United Nations, “General Assembly Resolution, A-HRC-10-11-Add.1,” 5.03.2009,

<https://documents-dds-ny.un.org/doc/UNDOC/GEN/G09/118/19/PDF/G0911819.pdf?OpenElement>, hat dîtin: 17.01.2021.

hevkirin. Zimanê etnîkî û zimanê dayikê ne heman tişt in. Zimanê dayikê ew ziman e, piştî ku mirovek ji dayik dibe hînî wî dibe û di pêkhatina nasnameya civakî ya mirov de roleke bingehîn dilîze. Bi gotineke din zimanê dayikê ew ziman e ku kesayetîya mirovan pê teşe digire. Ji bo ku cudahiya navbera zimanê dayikê û zimanê etnîkî çêtir bê famkirin, mirov dikare mînameke wiha bide. Jineke ne Kurd a ku zimanê wê yê etnîkî di heman demê de zimanê wê yê dayikê ye jî, bi kesekî Kurd re bizewice, hînî zimanê hevjinê xwe bibe û zarokên wê jî bi zimanê hevjinê wê mezin bibin, zimanê wan zarokan ê dayikê dê ji zimanê wan ê etnîkî cuda be.

Heke wekî ku feylesofê alman Heidegger dibêje “Ziman mala hebûnê” be, di rewşeke bindestiyê ya bi her awayî de, *mala* Kurdan her roj hinekî din bi serê wan de tê xwarê. Ji bo rizgariya ji rewşa neyînî ya ku Kurdî niha tê de ye, pêdivî bi çavdêrî, şopandin, tomarkirin, raporkirin û afirandina bîrekê heye. Di çarçoveya Projeya Çavderiya Mafên Zimanî û Çandî de bi awayekî zanistî, bi rêk û pêk û bi rê û rêbaz xebat dê bêne kirin, berhem bêne afirandin û belavkirin. Ji aliyekî ve cîhan derbarê rewşa Kurdî de bê agahdarkirin û ji aliyê din ve jî plansaziyeke xurt ji bo ziman û çanda Kurdî dê bê amadekirin û rewşa zimanê Kurdî bi awayekî şênber bê dîtin. Ji bo ku xalên der barê ziman û çandê de yên ku bi daxuyanî û peymanên navneteweyî hatine ragihandin bîn zanîn û sepandin, raporên bi vî rengî pêwîst in. Tirkiye bi xwe jî palpişt û şîrîka gelek peyman û daxuyaniyan e ku di nav wan de behsa mafên zimanî û çandî tên kirin. Lê mekanîzmayên navxweyî yên li Tirkîyeyê û yên li welatên din ên ku palpişt û şîrîkên van peyman û daxuyaniyan in, ji bo çavdêriya sepandina van peyman û daxuyaniyan a li Tirkîyeyê peywîrên xwe yan qet bi cih naynin yan kêma û kurt bi cih tînin yan jî bi awayekî objektîf bi cih naynin. Ji bo ku çavdêriyeke cidî, objektîf û rast û durist pêk bê, Tora Ziman û Çanda Kurdî hewl dide bi raporên bi vî rengî hem çavdêriyeke xweser û xwereng bike hem jî çavdêriya çavdêriya rayedar û berpirsiyarên fermî yên vî karî bike.

Ev xebata li ber destên we rapora duyemîn e ku bi van armancan hatiye amadekirin. Rapora yekemîn a bi navê *Zimanê Dayikê û Bikaranîna Wî Wek Hêmaya Bingehîn a Çandê* ya ku bi Kurdî, Ingilîzî û Tirkî hatibû amadekirin, demek berî niha belav bû. Di wê raporê de bi awayekî giştî behsa hiqûqa navneteweyî, mafên zimanî û çandî, rewşa mafên zimanî û çandî ya Kurdan a li Tirkîyeyê, komxebata giştî ya ku bi ragihandina Tora Ziman û Çanda Kurdî bi encam bû, tesbîtên arîşeyên zimanî û çandî yên Kurdan, pêşniyarên ji bo parastin û xurtkirina ziman û çanda Kurdan, avabûn, teşedan û ragihandina Tora Ziman û Çanda Kurdî û hwd hatiye kirin. Her wiha bi taybetî hemû

arîşeyên ziman û çanda Kurdan yek bi yek bi awayekî berfireh hatine vegotin û rê û rêbazên çareserkirina wan, pêşniyarên ji bo rêgirtina li wan arîşeyan jî hatine vegotin.

Di Komxebata Giştî ya Tora Ziman û Çanda Kurdî de, 11 û 12ê Rêbendana 2020an, ya ku li Amedê hat çêkirin, ji beşdarên civînê hat xwestin ku rapirsînekê bibersivînin. Bi giştî 300 kesên ji dozdeh qadên xebatê yên wek sendîkavanî, akademîsyenî, nivîskarî, muzîk, şano, sînema, wêne, tenduristî, karsazî, zimanî, hiqûqî û hwd ku di qadên xwe de pispor û baldariyeke wan a taybet li ser ziman û çanda Kurdî heye, beşdarî vê civînê bûn. Di nava wan de hinek kesên ku xebatên xwe bi awayekî serbixwe dikin û her wiha hinek kesên ku di bin banê saziyên sivîl ên wekî kovar, weşanxane, weqf, komele, însiyatîf û hwd de jî dixebitin û ji gelek bajarên Tirkiye û Kurdistanê yên wek Amed, Batman, Wan, Mêrdîn, Colemêrg, Semsûr, Dîlok, Meletî, Antalya, Stenbol, Îzmîr û hwd hebûn.

Ev rapora ku li ber destê we ye rapora duyemîn e ku li ser vê civînê hatiye amadekirin. Ev rapor bi awayekî giştî rapirsîna ku li gel beşdarên vê xebatê hatiye kirin, dinirxîne. Ev rapirsîna ku li gel 187 kesan hatibû çêkirin bi hûrgilî hate nirxandin û hewl hat dayîn ku bi vê xebata qadî bersivên xurt, berfireh û teqez ji hinek pirsên bingeşîn û giştî re bên dîtî û binpêkirinên mafên zimanî baştir bên dîtî û şopandin.


Divê neyê jibîrkinin ku ev rapirsîna ku ji aliyê 135 mêr, 44 jin û 8 kesan ve ku nexwestine zayenda xwe diyar bikin hatiye bersivandin, li qadeke spesîfîk û kesên ku xemxur û xîretkêşên ziman û çandê ne û di qadên xwe de pispor in bi wan re hatiye çêkirin. Di vê rapirsînê de 11 pirs hatine pirsîn û hewl hatiye dayîn ku rewşa zimanî û çandî ya takekesî û rewşa giştî ya hawirdora ku ew kesên di qadên xwe de pispor in tê de dijîn, were famkirin. Beşdarên vê rapirsînê ji aliyê temenî ve jî wek kesên di navbera 18-25 salî, 26-35 salî, 36-45 salî, 46-55 salî, 55 salî û zêdetir ji hev hatine senifandin. Li gor vê senifandinê 9 kes 18-25 salî ne; 61 kes 26-35 salî ne; 59 kes 36-45 salî ne; 33 kes 46-55 salî ne û 25 kes jî ji 56 salî yan jî pîrtir in. Her çi qas muxatabên vê rapirsînê ji gelek herêmên cuda bin jî, ji aliyê zayendî û temenî ve rengîniyeke xurt hebe jî, mirov nikare vê rapirsînê wek awêneyeke giştî ya rewşa Kurdan binirxîne. Ji bo famkirina rewşa giştî li herêmên cuda, bi zêdetir kesan re û bi pirsên hin spesîfîktir divê xebat bîn kirin.

Di vê raporê de encamên ku ji rapirsîneke ku ji yazdeh (11) pirsan pêk tê hene. Ev rapirsîn bi armanca destnîşankirina rewşa taybet a xîretkêş û xwebexşên ziman û çanda Kurdî hatibû amadekirin û çêkirin. Ji ber ku di dest-

pêkê de boçûneke ku encamên vê rapîrsînê li raya giştî bîn belavkirin tune bû û bi armanceke hinekî 'engtir hatibû amadekirin, nivîsandina raporeke giştî hinekî zehmet bû. Her wiha ji ber ku vebijêrkên taybet ên pîrsên rapîrsînê tune bûn, beşdarên gelek tişt û hejmarên ji hev cudatir dane û hejmara vebijêrkan ji bo dahûrandinê gelekî zêde bûne. Li gel gelek sedem û kêşeyên bi vî rengî jî me hewl da ku em encamên bikêrhatî jê derxin û wan agahiyên berbelav rêk bixin û pêşkêşî raya giştî bikin. Me agahiyên li ber dest bi 15 grafîk û 2 tabloyan nîrxandin û me hewl da ku bi awayekî kurt em vebêjin. Di dawiyê de jî me hewl da ku em çend analîzên giştî yê ku ji vê rapîrsînê mirov dikare derxe û dikarin bibin mijarên sereke yê hinek lêkolînên nû, nivîsandin. Di amadekirina vê raporê de kekê hêja Dr Cûma Çîçek ji min re bû palpişteki gelekî zexm. Ji bo xîretkêşî û xwebexşiya wî ya ji bo zîman û çanda Kurdî mala wî dîsa û her ava be. Her wiha dostên hêja Cewahir Sadak Duzgun û Savaş Dede jî li hemberî bêbextiya dem û derfetan ji min re bûn bext, mala wan jî her û her ava, siheta wan xweş be.


1. Dahûrandinên Sereke

Grafîk 1: Rewşa beşdarên rapîrsînê ya li gor temenê wan




Ji aliyê temenî ve 9 kes (%5) di navbera 18-25 salî de ne; 61 kes (%33) di navbera 26-35 salî de ne; 59 kes (%32) di navbera 36-45 salî de ne; 33 kes (%18) di navbera 46-55 salî de ne û 25 kes (%13) jî 56 salî û zêdetir in. Xuya ye ku xemxur û zehmetkêşên zîman û çanda Kurdî giranî navsere (26-55) ne. Beşdarbûna salmendan li gor rêjeya wan a di nav civakê de ne kêm e. Lê, li gel ku ji bo parastin û xurtkirina zîman û çandan, zarok û ciwan koma herî girîng in, rêjeya ciwanan di nav xemxur û zehmetkêşên zîman û çanda Kurdî de gelek kêmtir e. Ji bo parastin û pêşvebirina zîman û çandê hîmên bîngê zarok û ciwan in, ji lew re divê ji bo kişandina bala zarok û ciwanan bo ser zîman û çanda Kurdî divê hewleke zêdetir were dayîn û xebatên ji bo wan geştir bibin.

Grafîk 2: Rewşa beşdarên rapîrsînê ya li gor zayenda wan



Ji beşdarên vê rapîrsînê 44 kesane (%23,5) zayenda xwe wek jin; 135 kesane (%72,2) zayenda xwe wek mên û 8 kesane (%4,3) jî ev pîrs bê bersiv hiştîye, zayenda xwe diyar nekiriye. Li gel ku di afirandin, parastin û pêşvebirina zîman û çandê de roleke girîng ji bo jinan tê diyarkirin jî, di xebatên saziyî yê têkildarî zîman û çandê de rêjeya jinan kême.


Grafîk 3: Navên zarokên ku beşdarên rapîrsînê wan ji nêzîk ve nas dikin



Di pîrsa sêyemîn a rapîrsînê de ji beşdaran hatiye xwestin ku navê 10 zarokên ku li derdora wan in û ji nêzîk ve wan nas dikin, binivîsin. 187 beşdaran bi giştî 1809 nav nivîsandine, ji ber ku hin beşdaran ji dehan kêmtir nav nivîsandine. 1431 nav (%79) bi Kurdî ne⁴ û 378 nav (%21) ne bi Kurdî ne. Ji navên ne bi Kurdî rêjeyeke girîng navên bi erebî ne ku bi tesîra ola îslamê ketiye nav civaka Kurd. Her wiha kêmbûna rêjeya navên Kurdî mirov dikare bi wê qedexeya fîlî şîrove bike ku demeke dirêj li ser navên Kurdî he(bû)ye. Ji ber ku di van salên dawîn de ev qedexeya fîlî hinekî sist bûye, Kurd dikarin navên bi Kurdî li zarokên xwe bikin. Lê ji ber ku di alfabeya latînî de, ya ku ji bo Tirkî tê bikaranîn, ji bo hin dengên dengên bi Kurdî tîp tune ne, zarokên ku navên wan bi Kurdî ne, bi taybetî li dibistanan, rastî gelek serêşîyan tîp û gelek caran rû bi rûyê cihêkariyê dibin. Heta carinan mamosteyên wan ên ku ne Kurd in hewl didin ku navên cuda li wan bikin.

⁴ Her çî qas ji aliyê etîmolojîk ve nav bi nav, peyv bi peyv me xebateke taybet nekiribe jî, navên ku di nava Kurdan de bi Kurdî tên zanîn û bi wê hişmendiyê li zarokan hatine kirin, me bi Kurdî hesabandine.

Grafîk 4: Ji zarokên ku beşdarên rapîrsînê ji nêzîk ve nas dikin çend bi Kurdî dizanin û diaxivin




Beşdarên rapîrsînê bi giştî 1809 navên zarokan nivîsandine lê hinekan diyar nekiriye ka rewşa zarokan ji hêla zanîna zimên ve çawa ye. Bi giştî rewşa zanîna zîman a 1751 zarokan hatiye diyarkirin. Ji van 1166 zarokan (%67) bi Kurdî dizanin û diaxivin, 585 zarok (%33) bi Kurdî nizanin û naaxivin. Bêguman divê mirov vê yekê jî bi taybetî bibêje ku ji ber ku perwerdehiya Kurdî li gelek cihan û bi giranî jî ji bo kesên mezin tê dayîn, piraniya zarokên ku bi Kurdî dizanin û diaxivin jî nizanin bi Kurdî bixwînin û binivîsin. Bandora dersa hilbijartî ya Kurdî ya ku van salên dawîn kete meriyetê jî, hîna bi awayekî giştî di nava civakê de bandoreke guherîner çenekiriye. Divê bê gotin ku ev rêje zarokên Kurdan bi temamî temsîl nake. Bi taybetî jî dema ku mirov Kurdên ku li rojavayê Tirkiyeyê dijîn bişopîne, bi çavdêriyeke rojane mirov dikare bibêje ku rêjeya zarokên Kurdan ên ku bi Kurdî dizanin gelek kêmtir e. Di nav xemxur û zehmetkêşên zîman û çanda Kurdî de hewldaneke berbiçav heye da ku zîmanê Kurdî derbasî nîfşên nû bikin. Li gel ku gelek êrîş, cihêkariyên neyînî, armancgirtin û hwd li hemberî kesên Kurdîxêv tînin kirin jî, van hewldanan bandoreke mezin li zarokan jî kiriye. Li gel vê yekê, hîn jî yek ji sê zarokên ku aktîvîstên zîman û çanda Kurdî wan ji nêzîk ve nas dikin bi zîmanê xwe yê neteweyî nizanin.

Grafîk 5: Zarokên ku beşdarên rapîrsînê wan ji nêzîk ve nas dikin û navên wan bi Kurdî ne ji wan çend bi Kurdî dizanin û diaxivin



Her çî qas beşdarên rapîrsînê navên 1431 zarokên ku navên wan bi Kurdî ne nivîsandibin jî, der barê zanîna wan a bi Kurdî de bi tenê rewşa 1034 zarokan zelal kirine. Ji van 1034 zarokên ku navên wan bi Kurdî ne û rewşa wan a zimanî hatiye diyarkirin 741 zarok (%72) bi Kurdî dizanin û diaxivin û 293 zarok (%28) bi Kurdî qet nizanin. Mirov dikare ji vê nîşaneyê bibêje ku di nav civaka Kurdî de nişeke nû mezin dibe ku li gel ku navên wan Kurdî ye lê bi Kurdî nizanin. Diyar e ku zindîbûna nasname û hişmendiya neteweyî bi xwe re zindîbûneke zimanî nayne.


Grafîk 6: Aktîvîstên zîman û çanda Kurdî di sala 2019an de çend berhemên bi Kurdî (pirtûk, kovar, CD û hwd) kirîne?



Ji 187 beşdarên rapirsînê 169 kesan bersiv dane vê pirsê. Ji 169 kesan 6 kesan di sala 2019an de tu berhemên bi Kurdî nekirîne; 51 kesan ji 5 berheman kêmtir kirîne; 44 kesan di navbera 20 û 50 berheman de kirîne; 15 kesan ji 50 berheman zêdetir kirîne û 53 kesan jî di navbera 5 û 20 berheman de kirîne. Ji nava beşdaran kesê/a ku di sala 2019an de herî zêde berhemên bi Kurdî kirîne, 112 berhem kirîne. Dema ku hemû berhemên bi Kurdî yên ku ji aliyê beşdarên rapirsînê ve di sala 2019an de hatine kirîn li beşdaran werin belavkirin, serê her beşdarekî/ê 19 berhem dikevin.


Ji ber ku perwerdehiyê berbelav a bi zîmanê dayikê tune ye û di aliyê aborî de bazar û rewaca Kurdî qels e, berhemên bi Kurdî yên ku tên weşandin li gor pêdiviyên civakê gelekî kêmtir in. Lê li cihekî ku axaftina bi Kurdî, guhdarîkirina stranên, xwedîbûna pirtûkan, çêkirina hunerê ya bi Kurdî bibin armanca êrîşan, li cihekî ku her sal bi dehan pirtûkên Kurdî tên qedexekirin û bi dehan sazîyên civaka sîvîl ên ku Kurdî fêr dikin tên girtin û pêkutî û qedexe her roj hinekî din zêde dibin, tiştekî asayî ye ku rêjeya standin û xwendina pirtûkan kêmtir be.

Grafîk 7: Aktîvîstên zîman û çanda Kurdî di sala 2019an de ji berhemên bi Kurdî (pirtûk, kovar, CD û hwd.) yê ku kirîne çend ji wan ji bo zarokan kirîne?




Beşdarên rapîrsînê yê ku bersiv dane van pirsan diyar kirine ku di sala 2019an de bi giştî 3041 berhemên bi Kurdî (pirtûk, kovar, CD û hwd.) kirîne. Ji van berheman 564 (%19) berhemên ji bo zarokan in û 2477 (%81) jî ji bo mezinan in. Wek tevahiya cîhanê, di nava Kurdistan de jî rêjeya xwendinê her ku diçe kêmtir dibe. Tevî ku beşdarên rapîrsînê aktîvîstên zîman û çandê ne, bi awayekî giştî xwendina berhemên bi Kurdî gelekî kêmtir e û bi taybetî jî standîna berheman a ji bo zarokan û teşwîqkirina wan ji bo xwendinê û bi taybetî jî ji bo xwendina Kurdî gelekî kêmtir e. Tecrûbe û lêkolînên zîmanî nîşan didin ku parastin û xurtkirina zîmanekî girêdayî nîşana nû ye. Heger ku zîmanek derbasî nîşana nû bibe, ev yek tê wê maneyê ku ew zîman ne di xetereyê de ye. Lê heger nîşana nû zîmanî hîn nebe, ew zîman ketiya rêya mirinê û windabûnê.

Grafîk 8: Aktîvîstên ziman û çanda Kurdî di sala 2019an de li çend şanoyên ku zimanê wan Kurdî bûye temaşe kirine?




Ji 187 beşdarên rapîrsînê 168 kesên bersiv dane vê pirsê. Ji 168 kesên 42 kesên di sala 2019an de li tu listikeke şanoyê ya bi Kurdî temaşe nekiriye; 7 kesên ji 10 listikan zêdetir temaşe kirine; 27 kesên di navbera 5 û 10 listikan de temaşe kirine; 92 kesên ji 5 listikên şanoyê yê bi Kurdî kêmtir listik temaşe kirine. Ji nava beşdaran kesê/a ku di sala 2019an de herî zêde li listikên şanoyê yê bi Kurdî temaşe kiriyê li 30 listikan temaşe kiriyê. Dema ku bi awayekî giştî mirov hejmara şanoyên bi Kurdî yê ku di sala 2019an de hatine temaşekirin li beşdaran belav bike, her beşdarekî/ê li 4 listikan temaşe kiriyê.

Grafîk 9: Zarokên ku aktîvîstên zîman û çanda Kurdî wan ji nêzîk ve nas dikin li kîjan kanalên TVyê yê zarokan temaşê dikin?




Ji aktîvîstên zîman û çanda Kurdî hatiye pirsîn ka zarokên ku ew wan ji nêzîk ve nas dikin li kîjan kanalên zarokan temaşê dikin. Ji 187 beşdarên rapîrsînê 126 kesan bersiv dane vê pirsê. Yê ku gotine zarok tenê li Zarok TVyê temaşê dikin 48 kes in (%38). Beşdarên ku gotine zarok li gel Zarok TVyê li kanalên bi zîmanê din jî temaşê dikin 60 kes in (%48). Ji beşdarên 18 kesan (%14) gotiye ku zarokên ku ew wan ji nêzîk ve nas dikin qet li kanalên TVyê yê zarokan ên bi Kurdî temaşê nakin.

Grafîk 10: Zarokên ku aktîvîstên zîman û çanda Kurdî wan ji nêzîk ve nas dikin çend ji wan li TRT Çocukê temaşe dikin?




Ji nava 126 beşdarên rapîrsînê yê ku bersiv dane vê pîrsê 76 kesên (%60) diyar kiriye ku zarokên ku ew ji nêzîk ve nas dikin li kanala TRT Çocukê temaşe nakin lê belê 50 kesî (%40) gotiye temaşe dikin. Li gor grafîkên 9 û 10 dema ku mirov li bersivên beşdarên rapîrsînê dinêre, derdikeve ku TRT Çocuk parçeyê jiyana zarokên xemxur û zehmetkêşên zîman û çanda Kurdî ye jî. Divê ev yek di kar û xebat û plansaziya parastin û xurtkirina zimên de û di meseleya sosyalîzasyona zarokan bi zîmanê wan de li ber çav bê girtin. Dibe ku daxwaza weşana pîrzîmanî ji bo TRT Çocukê di nav daxwazên ji bo parastin û xurtkirina zîmanê Kurdî de cih bigire.

Grafîk 11: Zîmanê yekemîn ê ku beşdarên rapîrsînê di medyaya civakî de bi kar tînin kîjan e?




Ji 187 beşdarên rapîrsînê 166 kesane bersiv daye vê pîrsê. Ji vana 88 kesane (%53) diyar kiriye ku di medyaya civakî de yekemîn zîmanê ku bi kar tînin Kurdî ye; 23 kesane (%14) diyar kiriye ku zaravayê Kurdî yê kurmanckî bi kar tînin; 47 kesane (%28) diyar kiriye ku Tirkî bi kar tînin; 2 kesane (%1) diyar kiriye ku îngilîzî bi kar tînin û 6 kesane (%4) jî diyar kiriye ku zaravayê Kurdî yê kirmanckî bi kar tînin. Heke mirov yê ku bi taybetî Kurmanckî û Kirmanckî nivîsandine li yê ku Kurdî nivîsandine zêde bike, di nava beşdarên rapîrsînê de rêjeya kesên ku di medyaya civakî de Kurdî wek zîmanê yekem bi kar tînin dibe %71.

Grafîk 12: Zîmanê duyemîn ê ku beşdarên rapîrsînê di medyaya civakî de bi kar tînin e?



Ji 187 beşdarên rapîrsînê 133 kesane bersiv daye vê pîrsê. Ji van 71 kesane (%53) diyar kiriye ku di medyaya civakî de duyemîn zîmanê ku bi kar tînin Tirkî ye; 40 kesane (%30) diyar kiriye ku di medyaya civakî de Kurdî wek zîmanê duyemîn bi kar tînin; 8 kesane (%6) diyar kiriye ku di medyaya civakî de wek zîmanê duyemîn Îngilîzî bi kar tînin; 7 kesane (%7) diyar kiriye ku di medyaya civakî de wek zîmanê duyemîn zaravayê Kurdî yê kirmanckî bi kar tînin; 6 kesane (%5) diyar kiriye ku zaravayê Kurdî yê kurmanckî bi kar tînin û kesekî jî (%1) diyar kiriye ku zîmanekî din bi kar tîne. Heke mirov yê ku bi taybetî kurmanckî û kirmanckî nivîsandine li yê ku Kurdî nivîsandine zêde bike, di nava beşdarên rapîrsînê de rêjeya kesane ku di medyaya civakî de Kurdî wek zîmanê duyemîn bi kar tînin dibe %40.

Grafîk 13: Hejmara zîmanên ku beşdarên rapîrsînê di medyaya civakî de bi kar tînin



Ji 187 beşdarên rapîrsînê 166 kesan bersiv daye vê pîrsê. 92 kesan (%55) diyar kiriye ku ew di medyaya civakî de du zîmanan bi kar tînin; 41 kesan (%25) diyar kiriye ku di medyaya civakî de ew zîmanekî bi tenê bi kar tînin; 33 kesan (%20) jî diyar kiriye ku di medyaya civakî de ew sê zîmanan û zêdetir bi kar tînin.

Dema ku mirov Grafîka 12 û Grafîk 13ê bi hev re binirxîne, civata xemxur û zehmetkêşên zîman û çanda Kurdî di medyaya civakî de pir zîman in (%80). Li gel ku bi giranî zîmanê Kurdî bi kar tînin, Tirkî jî xwedî cihekê mezin e. Lê aktîvîstên ku ji xeynê Kurdî û Tirkî, zîmanên din bi kar tînin gelek kêman. Rêjeya kesên ku îngîlîzî bi kar tînin, bo nimûne, bi tenê %6e.


2. Dahûrandinên Berawirdî

Tablo 1: Li gor temenê beşdarên rapîrsînê dahûrandina berawirdî

	Temenê Beşdaran				
	18-25	26-35	36-45	46-55	56-Zêdetir
Navê zarokên ku beşdar wan ji nêz ve nas dikin ji sedî çend bi kurdî ne?	71,10	71,90	83,50	82,50	78,80
Zarokên ku beşdar wan ji nêz ve nas dikin ji sedî çend bi kurdî dizanin û diaxivin?	77,89	66,96	61,76	61,61	67,50
Di sala 2019an de çend berhemên bi kurdî (wek pirtûk, kovar, CD û hwd) hatine kirîn?	10,00	19,00	18,00	18,00	27,00
Çend ji wan berhemên ji bo zarokan in?	3,00	3,00	4,00	3,00	3,00
Di 2019an de çend lîstikên şanoya bi kurdî hatine temaşekirin?	5,00	4,00	4,00	4,00	2,00
Zarokên ku beşdar wan ji nêzik ve nas dikin ji sedî çend li kanalên TVyê yên zarokan ên bi kurdî temaşê dikin?	100,00	89,74	90,70	69,23	70,00
Beşdarên rapîrsînê ji sedî çend di medyaya civakî de kurdî wek zîmanê yekemîn bi kar tînin?	33,33	69,39	65,31	78,26	76,19

Ji bo Tablo 1 û grafîka wê (Grafîka 14) dikare gelek tişt bîn gotin lê belê tiştê ku pêşî bala mirovan dikişîne ev e: Her ku temen mezin dibe, ji aliyê şiyariya zîman û çanda Kurdî ve baldariyeke zêdetir çêdibe. Lê belê her ku temen biçûk dibe çalabûna ji bo zîman û çanda Kurdî zêdetir dibe. Bi awayekî zelaltir û bi mînak ku mirov bibêje, di navlêkirina zarokan de û di kirîn û xwendina berhemên bi Kurdî de kesên temenmezin li pêş in; lê belê di çûyîna şanoyê de, di standina berhemên bi Kurdî de yên ji bo zarokan û temaşekirina kanalên zarokan ên bi Kurdî kesên temenbiçûk li pêş in. Her wiha bi vê grafîkê mirov dikare vê yekê destnîşan bike ku her çiqas baldariyeke zîman û çanda Kurdî ya zêde li gel kesên temenbiçûk çêbûbe jî, di jiyana xwe ya li derveyî xelesa yekemîn a herî nêzî xwe de, di jiyana li derveyî jiyana û têkiliyên xwe yê taybet de, jiyana ku cîhana wî û gelek cîhanên din li nav hev dikevin di wê de û di medyaya civakî de kesên temenbiçûk dest ji zîman û çanda Kurdî berdidin û berê xwe didin zîman û çandên din.

Grafîk 14: Li gor temenê beşdarên rapîrsînê dahûrandîna berawirdî




Tablo 2: Li gor zayenda beşdarên rapîrsînê dahûrandina berawirdî

	Zayenda Beşdarên		
	Bê Bersiv	Jin	Mêr
Navê zarokên ku beşdar wan ji nêz ve nas dikin ji sedî çend bi kurdî ne?	86,25	87,00	75,39
Zarokên ku beşdar wan ji nêz ve nas dikin ji sedî çend bi kurdî dizanin û diaxivin?	68,75	66,98	65,18
Di sala 2019an de çend berhemên bi kurdî (wek pirtûk, kovar, CD û hwd) hatine kirîn?	12,00	15,00	21,00
Çend ji wan berhemên ji bo zarokan in?	2,00	3,00	4,00
Di 2019an de çend listikên şanoya bi kurdî hatine temaşekirin?	3,00	3,00	3,00
Zarokên ku beşdar wan ji nêzik ve nas dikin ji sedî çend li kanalên TVyê yên zarokan ên bi kurdî temaşê dikin?	100,00	96,77	83,33
Beşdarên rapîrsînê ji sedî çend di medyaya civakî de kurdî wek zîmanê yekemîn bi kar tînin?	57,14	42,11	80,83

Ji alî zayendê ve dema ku mirov hin bersivên beşdarên binêre, (Tablo 2 û Graffik 15) û hewl bide ku bibe xwediyê nêrîneke giştî ya li ser baldariya li ser zîman û çanda Kurdî, mirov dê bibîne li gel ku di hişyariya ji bo parastin û pêşvebirina zîman û çanda Kurdî cudahiyeke zêde berbiçav di navbera jin û mêran de tune ye jî, jin di gelek waran de ji mêran pêşvetir in. Lê di bikaranîna Kurdî ya di medyaya civakî de û di kirîna berhemên bi Kurdî de di navbera jin û mêran de ferqeke pir zêde heye. Her wiha di kirîna berhemên Kurdî de yê ji bo zarokan wekhevîyek heye ku ji pênc berhemên ku kirîna yek ji bo zarokan bûye.

Grafîk 15: Li gor zayenda beşdarên rapîrsînê dahûrandina berawirdî



3. Dahûrandinên Giştî

1. Ev rapîrsîn bi xemxurên ziman û çanda Kurdî re hatiye çêkirin ku ew di qadên xwe de pispor û aktîvîst in û temamiya civakê temsîl nakin. Lê tê çaverêkirin ku ji aliyê parastin û xurtîkirina ziman û çanda Kurdî ve li pêşiya civakê bin. Lê belê mirov encamên ku derketine holê di wan de xetereya ku ziman û çanda Kurdî tê de ye bi awayekî şênber dibîne. Rêjeya bikaranîna Kurdî û baldariya ji bo çanda Kurdî kêmtir dibe.

2. Li gel ku ji bo parastin û pêşvebirina ziman û çandê roleke girîngtir ji bo jinan tê destnîşankirin jî, di nav xebatên giştî yên ji bo ziman û çanda Kurdî de rêjeya jinan (%23,5) li gor ya mêran (%72,2) gelekî kême.

3. Li gel ku rêjeya herî zêde ya gelheya Kurdan ciwan in jî, di nava xebatên ziman û çanda Kurdî de rêjeya ciwanan gelekî kême. Şiyariya ji bo parastin û pêşvebirina ziman û çanda xwe, xwehezî û xwezanî di temenekî dereng de dest pê dike. Bi taybetî jî piştî 25 saliyê, ango piştî ku zanîngeh jî tê kutakirin “lixwemikurhatin” û “lixweveger” çêdibe ku ew jî diyardeyeke teqez e ku “jixweçûnek/jixwedûrketinek” çêbûye, asimilasyon çêbûye. Ji ber vê yekê jî bi taybetî divê xebat werin kirin ku xebatên li ser ziman û çanda Kurdî di temenekî zûtir de di nav civaka Kurdî de belav bibin. Bala zarok û ciwanan bêhtir bê kişandin ji bo famkirina girîngiya ziman û çandê.

4. Li gel ku şiyariya ji bo parastin û pêşvebirina ziman û çanda Kurdî zêdetir jî dibe, sepandin û bikaranîna wê di jiyandê de bi nîfşên nû re kêmtir dibe. Ev yek xetereyeke mezin e ji bo ziman û çanda Kurdî. Wekî ku tecrubeya netewe û welatên din jî nîşan dide, ji bo ku ziman û çandê bîndest bîndest parastin û xurtîkirin, divê ew derbasî nîfşên nû bin.

5. Her çî qas hemû beşdarên rapîrsînê aktîvîstên ziman û çandê bin û di van qadan de xwedî bîr û baweriyên xurt bin jî, rêjeya xwendina bi Kurdî û çalakiyên çandî yên wek şanoyê gelekî kême.

6. Bi tenê %19ê berhemên bi Kurdî yên ku di sala 2019an de hatine kirin ji bo zarokan in, ev jî nîşan dide ku parastina çand û zimanê Kurdî roj bi roj diwartir dibe.

7. Li gel ku bi milyonan zarokên Kurdan hene, şiyarî û daxwazeke girîng a parastina çand û zimanê xwe heye û di hemû qadan de girîngiya kanalên TVyê yên ji bo zarokan tê bilêvkirin jî, zarokên Kurdan mehkûmî kanaleke bi tenê ya bi Kurdî ne û li hemberî wê bi sedan kanalên zarokan ên ku bi zimanên din weşana xwe dikin hene.

8. %76ê zarokên Kurdan ên ku li kanalên bi Kurdî temaşe nakin, li kanala

fermî ya dewletê ya ji bo zarokan, TRT Çocuk, temaşe dikin. Di wê kanalê de yekparêziyeke bi her awayî heye, ji zîman û çanda Kurdan tu tiştek tê de tune ye. Divê ev rêjeya girîng a temaşekirina zarokên Kurdan a wê kanalê li ber çavan were girtin û daxwaz ji dewletê bê kirin ku li gor vê yekê gavan bavêje. Divê TRT Çocuk hem ji aliyê naveroka xwe ve pirreng û pirdeng be û hem jî pîrzîmanî be.

9. Li gel ku %71ê beşdarên rapîrsînê bi awayekî giştî di medyaya civakî de Kurdî wek zîmanê yekemîn bi kar tînin jî, di nava ciwanên Kurdî de ev rêje kêmtir dibe û ev jî xetereyeke girîng e. Lewra medyaya civakî bêhtir ji aliyê ciwanan ve tê bikaranîn. Her wiha %55ê beşdarên rapîrsînê gotine ku di medyaya civakî de du zîmanan bi kar tînin û zîmanê duyemîn ê ku tê bikaranîn jî bi rêjeyeke zêde Tirkî ye. Ev yek nîşan dide ku civata xemxur û zehmetkêşên zîman û çanda Kurdî bi xwe jî bi giranî duzîmanî ye. Lê ev duzîmanî ne stabîl e û berê wê ber bi yekzîmaniya Tirkî ve ye.

Wek Encam

Li gel ku ev rapîrsîn bi beşeke taybet û biçûk a civakê re hatiye çêkirin û pîrsên ku hatine pîrsîn kêmtir û ne berfireh in jî, gelek encamên girîng dikarin ji vê rapîrsînê werin derxistin. Ji her pîrsêkê çend pîrs derdikevin û her bersivêk dike ku mirov li hinek bersivên din ên spesîfîktir bigere. Lê belê encama herî girîng jî ew e ku pêdivî bi gelek rapîrsîn û xebatên bi vî rengî heye da ku rewşeke zelal, wêneyekî rasteqîn ê civaka Kurdî derkeve holê; xebatên ku di qadên zîman û çandê de dê bêne kirin li gor pêdiviyên sereke werin kirin û bi hêza herî kêmtir sêda herî zêde were wergirtin. Lewra hêza heyî ya zîmanhez û çandparêzan ji bo parastina zîman û çanda Kurdî gelekî kêmtir e.

Li hemberî asîmîlasyonê ku êdî di hemû mal û odeyan de, di hemû bîr û boçûnan de, di hemû mêjî û şaneyan de hatiye bicihkirin, berxwedaneke dûr û dirêj lazîm e. Berxwedana heyî jî ne bi awayekî bipergal e, bi destelepkan, bi awayekî bêserûber e. Ji ber bêpergalî û bêserûberiyê xebatên ku bi kedên zêde tên kirin jî, gelek caran berhewa dibin û nagihîjin armanca xwe.

Ji bo ku xebat bi rêk û pêk bên kirin, divê plansaziyên demdirêj û demkurt hebin. Ji bo amadekirina van planan jî pêdivî bi zanîna rewşê heye û ji bo zanîna rewşê jî divê rapîrsînên spesîfîk ên qadî werin kirin û di encama wan dahûrandinan de ku dê bêne kirin, plansazî werin çêkirin û xebat bên kirin.

Pêvek: Mînaka Rapîrsînê ya ku Hatiye Çêkirin

RAPÎRSÎNA ZIMAN Û ÇANDÊ

1- Temen

- 18-25 ()
- 26-35 ()
- 36-45 ()
- 46-55 ()
- 56- Zêdetir ()

2- Zayend

Jin () Mêr ()

3- Navê deh zarokên ku tu dinasî binivîse.

- 1.
- 2.
- 3.
- 4.
- 5.
- 6.
- 7.
- 8.
- 9.
- 10.

4- Ji van zarokan çend bi Kurdî dizanin û dipeyivin?

Qet nizanin:

1 2 3 4 5

6 7 8 9 10

5- Di sala 2019an de te çend berhemên bi Kurdî (wek pirtûk, kovar, CD û hwd) kirîn?

.....

6- Çend ji wan berhemên zarokan in?

.....

7- Ji wan pirtûkan te çend xwendin?

.....

8- Di 2019an de te li çend lîstikên şanoya Kurdî temaşe kir?

.....

9- Zarokên we li kîjan kanalên televîzyonê temaşe dikin?

.....

10- Di medyaya civakî de tu kîjan zîmanan bi kar tînî, li gor rêzê binivîse?

1 2

3 4

11- Ji kerema xwe gotîneke pêşiyana an jî biwêjeke bi Kurdî binivîse.

.....
.....



Web: www.torakurdi.org
E-mail: info@torakurdi.org